XORTEN ŞOREŞGER'e.

Dev-Genca lîseyî hinde pêşbajo û komwerî dibe, li pirsên gel yên aborî-demokratî û ranyarî bêramîn namîne, di pîveka rêxistinî û gehîneka birewerîya xwe de li pînsên gel jî bi xwedî derdikeve.

Bizavên Çepa Şoreşger di nêvçîna karkerde jî dajo, di vî bergehîde bi Tevgera Karkerên Şoreşger îfade dibe. -Vî navî distîne- Di karxan, atolye û kargehên ko xebata Çepa Şoreşger heyî de, heya îro di ber pir bizavên grêv, karberdanî, pêşandan, berrabûn û piştdayîniyên pêkanîyî de; di nêv celeba karkeran de jî kara birêxistina hindeyê hêza xwe bizavên şiddetê yên şoreşgerî kirîye. Çepa Şoreşger, li daxwazên aborî-demokratî yên çîna karker xwedî derketîya, hindeyê hêza xwe xebata bihendam kirina vê têkoşînê kirîye, li bobelat /qeda/ yên kar ko li welatê me pir çêdibin bêdeng nemaye, pêşandanên kokekî yên distûrî, nedistûrî ristkirîne, bizavên têvel anînepê. Dîsa rêxistinî û têkoşîna Çepa Şoreşger di nêv karmend /memur/, fêrmend û hd. tim celebên zehmetkêşande her diçe pêşve dajo. Di ber van da Çepa Şoreşger, di gehînekên têvel de ji rêxistinî û têkoşîna jinan re di xebateke bilindkirinîya berçav de ye. Çepa Şoreşger, li hemberê kêma hiştina bûhayên bingehînên di çandinîyê de li daxwazên berpeyîya xwe serzman kirina berhemkeran, mîna di berê de dibû pêşandanên komekî û bi dirvên têvelên bizavê xwedî derketîye.

Çepa Şoreşger, ji bo pêşvebirina mafên demokratîkên ko hemû celebên komelê pêwenddar dikin -bi nêringa bo şoreşê têkoşînê ve girêdayî mayîne- têkoşînê dajo û di vî qadî de; pirre xebat û bizav birêxistin kirîne. Di van salên paşî de li hemberê tûnd, girtin û binçavkirin û ji îşkencan derbas kirinê re girtîkirin, bi mehan-salan tolayên zindanê dayînen faşîzmê yên raberê rêxistinên komelî yên komekî û kovarên çepên legal /distûri/ bêdeng nemaye, kampanya û bizavên van tûnd û hêrîşan protesto dikin ristkirîne, bi birewerî û wêrekî dayîna komekan, di vê bergehê de li pêşîya hêrîşên faşîzmê hêt /set/ kêşan amançkirîye.

Dîsa mîna li berê, berî 12 Îlon 1980'yê dibû li hemberê damazrekên empenyalî û olîgarşîyê yên îstixbarat/sixurvanî/ û provakasyonên MÎT-CIA'yê ko di pêşberê têkoşîna şoreşgerî ya her diçe bilinddibe de, ji bo di serê komekan de têkoşîna şoreşgerî û şiddeta şoreşgerî bêkêr/bêtesîr/ bihêlin û bikin ko bi sotinayîyê re bêye yek /nêverokê/ kujtarên en-



damên fêrmendên pêşverû-demokrat û hêrişên raberê çapmênîya burjûvayî tînin rojevê. Û ji bo di encamêde jî di serê gel de îmaj /rêman/ek û şêlokirineka bireweriyê ko mîna "serkanîya van bizavan tevan yeke; teror" afirandina wan Çepa Şoreşger li van xebatan meyzekekar nemaye, ji bo komekên herrî firehtirîn di vî warî de dilhaykirin û bi birewer kirinê bi, zav û pêşandariên van provakasyonan leşhîr û protesto bikin pêkanîne.

### **BİZAVÊN ÇEPA ŞOREŞGER EN DÎJÎ-EMPERYALITIYÊ Û EN RABERÊN PÎŞTGIRINIYA NÊVNETAWÎ**

Bizavên Çepa Şoreşger yê raberê piştgirtinîya nêvnetawîyên dijî-emperyalî hêj Çepa Şoreşger weke avabûyîneke cihe derneketî nêvengê destpêkirîne. Kadir û dilxwazên ko dûvre dê Çepa Şoreşger avabikin hîn di wî demî de jî karkirine ko ji karmendiyên xwe ên dijî-emperyalî paşde nemînin.

-Di meha Nîsan'a '77'ê keştî /gemî/ya bi navê "Esmeralda" ko bûyîbû şkencexanek ya faşîzma Pinochet -Pnoşet-ê bi derbeyeke xwîndar erka Şîlî'ye xespkirî wekî hate bandêra Stanbol hatîye protesto kirin, konsolosîya Şîlî kîsman hatîye rûxandin.

-Hizêrana 1977'ê bi mebesta protesto kirina dewleta Hollend ko gerîllayên Moluka'yî di dirveke direndî/werşîyare/de qetil kirîn, li pêşîya konsolosxana Hollend ya Stanbol pêşandaneke protestoyê hatîye ristkirin.

-Dîsa Hizêran'a 1977'ê bi mebesta protesto kirina bi bombarankirinê qetil kirina gelê Sehva Rojava bi balafirên emperyalîstên Frensî, li pêşîya balozxana Frensî ya Stanbol pêşandaneke hatîye ristkirin û ji alîyê bereya Polîsario bûyîne me hatîye pihêtkirin.

-Îlona 1977'ê ji bo protesto kirina manewrên NATO'yê li welatê me pêkanîyîn û cenkeştîyên DYA'yê yê li Stanbol rawestayîn di ber bizave peyhev de, leşkerên DYA ên derketîn bejê hatîne avêtina deryê, hatîne hingavtin. Fakûlta Maçka ya Ünîversîta Teknîka Stanbol ji alîyê Dev-Genç ve hatîye vegirtin, li emperyalîya DYA le'net hatîye barandin.

-Ç.paşîya 1977'ê de emperyalîya Almanî ko ser balefirgeha Magodişu'de girtî û 2 gerîllayên Filistînî qetilkirî

Li mebesta protesto kirina emperyalîya Almanî, Navenda Roşenbîrîya Alman hatîye rûxandin.

-Çepa Şoreşger, Tebaxa 1978'ê li Iranê tûnd û sotinayî ya reberê gelê Iranê ya rejima Şahê feşîst le'net kirîye, li pêşîya konsolxana Iranê pêşandaneke protestoyê ristkirîye, ji bilî vê di pêşandaneke din de jî Rêbaxaneya Iranê rûxandîye.

-Çirîyapaşî'ya 1978'ê bi mebesta protesto kirina dewleta Belçîkî ko daberirîye gerîllên Katangî li pêşîya Konsolxana Belçîkî ya Stanbol pêşandan hatîye ristkirin, zîrar hatîye dayîne li avahîya konsolxanê.

-Dîsa Ç.paşîya 1978'ê bi mebesta protestoya levhatina Camp-David ko di sinçê hêrîşekê de ye li ser têkoşîna gelê Filistîn li hember emperyalî û Siyonîyê rêvedibe, di yek rojê de li pêşîya konsolxanên DYA, Îsraêl û Misrê pêşandan ristkidîne, kara şewitandina avahîyê Konsolxana DYA kirîye, zîrarên maddî dayîne avahî.

-Di Reşmeha 1978'ê de bi mebesta protesto kirina derbase^bizavê bûyîna bargehên emperyalîya DYA ko bi demeke bihorbar hatîbûn bêbizav kirin û bargehên wê ên Tirkîye kirîn bin kontrola xwe cardin dewrê DYA kirîn Çepa Şoreşger, li pêşîya Rêbaxaneya Amerîkî pêşandaneke ristkirîye zîrar daye nivîsxanê, dîsa pêşîya tomovîla Ateşeyê Roşenbîrî ya DYA hatîye birîn, bi bombe û gulleyan hatîye rûxandin.

-Berî 12 îlon 1980'yê çend rojan, li hemberê manewra NATO yê ya li herêma Trakya destpêkirî de kampanyak fireh pêkanîye.

Çepa Şoreşger, di ser ko hingên giranên lêketîn re jî, karmendiyên dijî-emperyalî ên têkoşîne danîn ber de bi hîrdêyê hêza xwe karkirîye ko bicîbîne.

Bi vê mebestê;

-1982'yê ji bo protestoya dagirkirina Lubnan'é ya Îsraêl û tevqirênen Şabra-Şatîlla bizavên raberê damezrekên DYA û Îsraîlê pêkanîne.

-1986'é belavok, dest-hêlnameyên raberê protestoya bombarana Lîbyayê ya Amerîka belavkirîne, afîş û pul zeliqandîne, rêzokine bizavên pankart daleqandinê pêkanîne.

-1987-'88'é bidehhezaran belavok û desthêlnamên raberê piştgirtinîya serîhildana Filistînê belav kirîne, bidehan pankartên bibomb-bêbomb hilawistîne, pêşandanên komekê yên korsan ristkirîne.

-1988'é ji bo protestoya tûnd û tevqirênên rejima Pinochet li Şîlî ên raberê gelê Şîlî ser nivîsxana konsolosîya Şîlî'yê li Stanbol de hatiye girtin, hatiye rûxandin.

-Çepa Şoreşger, 1989'é bi hilavtin /teîn kirin/ û hatina Balyozêmezîna DYA ji bo Tirkîye, Abromowitz ve raber kirî,

-1989'é raberê dagirkirina Panamê ya emperyalîya DYA ve kirî,

-1989-'90'é bi raberê protestoya dijî-şoreşîya li Romanyê pêkhatî kirî bidehhezaran desthêlname, belavok belavkirîne, pankartên bibomb-bêbomb daleqandîne û pêşandanên komekîyên korsan ristkirîne; hinde avahîya rêxistina xwe bihêz kirî, dest bi hîn pitir karmendîyên xwe yên dijî-emperyalîyê bicîanîne kirîne.

Çepa Şoreşger ji derveyê bizavên jorîn li derveyê welêt, di yekîtîyên têde peydabûyî tevandedi nêv pêşandanên dijî-emperyalî û bizavên raberê piştgirtinîyên nêvnetawî de di dirvek bibizavtirîn de cîgirtîye.

Kadro û dilxwazên Çepa Şoreşger di bergehên têde bûyîn de têkoşîn kirin li hemberê emperyalî û pevkarên wê de asê bûyîn ji xwe re karmendî nasîne.

Di çaxê cunta faşîsta 12 llonêde, di nêv têkoşînêde ji alîyê hêzên polîs û ordîyê ve bihezaran têkoşêr, dilxwazên Çepa Şoreşger li meqerên polîsan, di nivîsxanên şax/şube/ên sîyasî û qîşlên ordîyêde ji şkencan hatîne derbaskirin û tijîyê zindanan hatîne kirin. Di zindanan de jî şkencan domandîye. Têkoşêr û dilxwazên Çepa Şoreşger, li zindanan li hemberî şkencên karbidestên faşîst de, dankirinîyên wan de bilehengî li berxwedane û di deh salande ji salekê pitir berxwedanên birçîmayîne kirîne.

Mîna me kampanya derpêşkirîn îfadekirî jî, di sala 1984 ê de di bizava Rojîya Mirinê ya pêkanîde sê cengbazên xwe ên pêşewa şehîd dayîne.

Çepa Şoreşger, di dadgehande jî, tewrê xwe yê komûnîstî domandîye, nebûye ê tê berdadkirin, bûye ê berdad dike. Ramên xwe yên ramiyarî bi wêrekî paristine, li bizavên xwe

bixwedî derketiye.

Têkoşîna Çepa Şoreşger, di roja me de jî her diçe bilindtir dibe û Çepa Şoreşger îro hêza hîn biserpeyî û bizav tirîna têkoşîna şoreşgerîya di welêt de ye. Bangeya hîmî ya Çepa Şoreşger "Heya Rizgarîyê Ceng"e. Heya şoreşê dê bi vê bangayê ve girêdayî bimîne.

### III- AMANCÊN GELEMPERÎ YÊN ÇEPA ŞOREŞGER

Çepa Şoreşger, şoreşa gelêrîya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşî beramanç dike. Ev şoreşa he, dê dawiyê bide bandêra emperyalîyê ya ramyarî, aborî leşkerî û roşenbîrî, dê çînen pevkarên wê yên cihkî ji erk bîne xwarê, dê tûnda netawîya li ser netawê Kurd ji nêvengê rake. Bi şoreşa gelêrîya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşî welatê me dê bigihêje serxwebûna xwe û dê bi demokrasîya gelêrîya rastînî bêye gerîandin.

A şoreşa gelêrîya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşîyê divêtbar dike hoyên welatê me ên civak-aborî, ramyarî nin.

Welatê me li serî DYA heyî welateke bi emperyalîyê ve girêdayîye. Di çaxê Împaratorîya Osmanî de (di nivê dûwemîna sedsala 19. de) pêvajoya niv-mêtingeh bûyînê ya destpêkirî, bi cenga Rizgarîya Netawî a 1920'ê xasma di bergehê ramyarîde di ser ko dawîbûyîbû re jî piştî cenga Cîhanîya II. welatê me dîsa hatiye mêtingeh kirinê. Û mêtîngerîya vê carê; nû-mêtingerîye. Emperyalîzm, ne bi leşkerên xwe bi ramyarî û bi leşkerî ordîya cihkîya bi xwe re gireêdayî kirî ve welatê me vegirtîye. (vegirtina dizî) Emperyalîyê, bi kapîtalîyek bi xwe ve girêdayî ya xahrevaja dayî pêşajotînê bi rêvebirîya burjûvazîya pevkarê kartelî û axayên xakan yên mezin girêdanîya ramyarî pihêt kirîye, kelk /xwêk/ danîne ser kelkên xwe. Emperyalîyê, erkên ramyarî di rewşa ko bêyî destûrê ji wê bistîne neşêye bilepitê de, wekî erkên sivîl neşîyan gerîmendê bikinderbên leşkerî yên faşîst dezge kirîne. Welatê me bi bargehên leşkerî tijekirîyê û adeta anîye di rewşeke bargeha balafirvanîyê de. Emperyalîyê, ji aliyê aborî ve welatê me bitevayî kirîye girêdayê xwe, daye bin ferma damezrekên fîransî/diravî/yên emperyalî ên nêvnetawî mîna IMF/Fona Diravîya Nêvnetawî/ û Banka Gêtiyê.

Burjûvazîya cihkîya kartêlvana pevkarê emperyalîyê û hevkarên wê xwedî xakên mezin, tefevan-bazirgan welêt bi

faşîzmê gerînende dikin. Çînên fermwerên cihkî/dîmatî/, wêkî faşîzma parlementer ji kar dikeve faşîzmê tînin da xwêkên xwe jîyana xwe ya lûks ko ji dirkeve diredî gelê me mêtinê bidestxwe kirîn bêxin bin dimanê/garantîyê/ ji bo wana ji bilî faşîzmê tu çare tunne. Demokrasî, ji bo olîgarşîyê bareke ko neşêye debara wê bike ye.

Vaye ji ber vê, pêdivêtîya şoreşeke dijî-emperyalî, dijî-olîgarşîyê ya welatê me heye. Hêza pêşewayê vê şoreşê proletarya ye. Belam, de şoreşê de çîna ko berjevendiya wê heyî bitenê proletarya nine; gundî û biçûk-burjûvayên bajarî jî hêzên hîmîyên vê şoreşênin. Şoreşa gelêriya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşîya di pêşewatîya proletaryîde dê bibe şoreşeke çînên zehmetkîş tevî têtetînê.

#### IV- STRATEJÎYA ŞOREŞÊ YA ÇEPA ŞOREŞGER

Çepa Şoreşger **Stratejîya Ramyarîbûyî ya Cenga Leşkerî (PASS)** Stratejîya Şoreşa Gelêriya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşîyê pêkbîne pêdandîye./tesbît kirîye/

PASS, têkoşîna çekdarî hîm, têkoşînên bi dirvên dun ên ramyarî, aborî-demokratî bi vê ve girêdayî bête ajotin, ji pêvajoya cenga pêşengî bi derbasbûnê ye ko stratejîya cenga gelêriya bigihêje serfirazîyê ye. Welatê me di bin vegirtina emperyalîyê de welateke nû-mêtingehe û bitimî bi faşîzmê têye gerînanandin. Bi pêwendîyên nû-mêtingerîyê re bihevreyîn, li welatê me kapîtalî di pîvekine dîyar de pêşajotîye. Belam evya he, ji her nêringê ve kapîtalîzmeke bengîyê emperyalîyê ya xahrrevaje. Di welatê me de dijîtîyên/nakokîyên/ çîneyî pir dijwarin. Belam, bi pêşajotina kapîtalîya xahrevaj dîtberêke refahê ya nisbî afirandîye. Ev, wekî bi îmaja dewleta tûndker ya di srê komekande digihêje hev û din, di ser pir dijwarbûyîna nakokîyên çîneyî re jî, dibe sedema ko evên han bi dijwarîya xwe ya tevayî re dernekevin berçavan. Ji alîyê din vegirtina emperyalîyê ya dizî, ne dîyar, berpeyîyên netawî ên gelê me li hemberê emperyalîyê notralîze dike. Di bin vegirtina dizî ya emperyalîyêde bûyîna welatê heya kujîyên xalî ên welêt belavbûyîna kontrola emperyalî, bi faşîzmê gerînadina welatê i me'na burjûvayî jî neyîna mafê azahîyên demokratî, ji bo kêşana komekên di welatê me de ber bi refên şoreşê de cengeke gelêriya ko dê ji cenga pêşengî derbazbibe divêtbar dike.

Ev cenga he, di hûndirê tevhevîya dîlektîkî ya yaban-bajaran de dê li yaban/çoleberî/yan û bajaran bi hevûdin re bêye rêvebirin. Çepa Şoreşger vê rewşa he di dirvê "Cenga Yekbûyîya Şoreşger"de formûle dike.

Çepa Şoreşger, di ser heya îro bi nêringa vê fêmdariya stratejîk, ajotina têkoşîna xwe ya şoreşgerî re jî, ji bo-yî hêj neşîyaye partî bibêye, doz neke ko îro PASS derbazê jîyarê kirîye; belam bi vê nêringê rêxistî dibe û têkoşînê dike. Lewra, di gehîneka têkoşîna xwe ya îro de têkoşîna çekdarî hîm digire.

### V- ÇEPA ŞOREŞGER DÎ PEVAJOYA PARTÎBÛYÎNÊ DE YE

Çepa Şoreşger, bi stratejîya diparêze re lêhatî karn rêxistîbûnê dike. Bi gor vê fêmdariya rêxistinî, di dest-pêkê de, jevkirina partî û rêxistinîya leşkerî divê neyê-kirin. Partî, di eynî demî de divê rêxistineke leşkerî be û ev rêxistina he ya hîmî, divê bi rêxistinîyên ramyarîyên bergehên jîyarê tevê vedigrin re tevhev bibe. Hêj tevgerê-ke ber bi komekan ve berfirehbûyî nehatî afirandinê dê ne-şêye timdomîya têkoşîna çekdarî bêye pêkanînê.

Çepa Şoreşger hêj, negiheştîye gehîneka vê rêxistinîyê. Pêvajoya partîbûyînê dijê. Belam Çepa Şoreşger, pêvajoya partîbûyînê, pêvajoyeke ko dawîya wê ne diyar jî nabîne. Lê-belê, rêxistineke ko neşîyê bizavên partîyê bicîbîne mîna "partî"yê rawekirinê jî nabijêve.

Pêvajoya partîbûyîna Çepa Şoreşger, di ser ko berî 12'ê Îlonê çendî xwe gihandibe gehîneke lipêş jî, hêrişên cunta faşîsta 12ê Îlonê ev pêvajo pergê nêvbir dayînê kirîye. Lewra Çepa Şoreşger, di hoyên em têde hêj pêvajoya partîbûyînê dijî.

Çepa Şoreşger, tu caran pêvajoya partîbûyînê pêvajoyeke hazirîyê, ji têkoşînê hatîbirîn bidestxwe negirtîye. Partî-bûyînî, ancaq di hûndirê têkoşîna ko hoyên ramyarî divêtbar kirî de bi cîgirtinê dê pêkbêye. Bi vê têgihanê Çepa Şoreş-ger, ji demê derketî nêvengê û vir ve têkoşîna ramyarî be-tal nekirîye, bi pêvajoya partîbûyînê ve girêdayî dest xwe girtîye.

Çepa Şoreşgera bi vê nêringê têkoşîna xwe ajotî, di de-mê 12ê Îlonêde di ser hingên ew hingevtîn raberê windakiri-na hêzeke diyar bûyîye re jî, di pêvajoyê de ev ya he (windabûna hêz) di pîvekeke mezinde telafî kirîye û îro di ri-

ya partîbûyînê de ji nêvberine giring qevaztîye.

## VI- TÊGÎHAN/FEMMERÎ/ A BERE/ENÎ/-YEKÎTÎ'YE YA ÇEPA ŞOREŞGER

Çepa Şoreşger, pêdandîya şoreşa gelêriya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşî dê bi hevkarîya gel, çîn û qorên têvel pêkbêye kirî, paristvanîya avabûna bereyê tenê û tenê di pêşewatîya partîya proletaryêde dike. Bêyî bi hebûna partîya proletaryê ya pêşewatîya çînên kedkar bike û têkoşîna şoreşgerî bêyî bigihêje gehîneka têtetîniya çînên zehmetkêş bi berfirehî neşêye avakirina bereyeka gelêrî ko çîn û gorên kedkar biyekbike bêye ramîn. Lewra, bereyên ji îro ve bêne damezrandin mehkumên li ser kaxezê mayînê nin.

Belam, di hoyên ko em têdenin de li hemberê faşîzm û emperyalîyê ma yekîtî neşê bêye pêkanîn? Çepa Şoreşger, parisvanîya şîyan pêkanîna vê kirîye û ji serîde jî bo vê xebatkirîye. Çepa Şoreşger, mîna berî 12ê Îlonê, piştî 12ê Îlonê jî, ji bo "yekîtîya hêzî û bizavî" ya hêzên dijî, faşîstî pêkanînê çend caran gazî kirîne, bi vê mebestê tevîlî civînan bûye. Belam mixabin ko, ji ber ranyarên grûbên pêkir, destberdanî/teslîmî/ di vê babetêde peşajoyeke berçav nehatîye bidestkirin. Di ser vê re jî Çepa Şoreşger, ji bo pêkanîna "yekîtîya hêzî û bizavî" dê ji xebatên xwe ajotinê lipaş nemîne. Çiko, li hemberê faşîzm û emperyalîzmê, pêvistî bûyîna pêkanîna yekîtîya hêzî û bizavî ji vekiranga berjevendîyêh şoreşê ve tişteke diyare.

Di vê çarçevêde Çepa Şoreşger, di pêşberê grubên din çep, têkoşîna îdeolojîk her demî bi hîmî girtîye û guhê xwe da ye ko tevîlî pevçûnên nêva çepede nebe. Em dişên bêjin ko tevgera şoreşgerîya ko tevîlî pevçûnên nêva çepêde nebûyî û destê xwe li xwîna şoreşgeran wernedayî tenê Çepa Şoreşgere. Çepa Şoreşger, li pevçûnên di nêvbera grubên çep de meyzekar nemaye, ji bo dawîdana van pevçûnan xebata ji desthatî kirîye.

Çepa Şoreşger, divêtîya têkoşîna îdeolojîka di nêvbera grubên ko li hemberê faşîzm û emperyalîzmêde di nêv hêzên gelêrî de dibîne hîm standinê; ji bo "yekîtîya hêzî û bizavî" şert bûyîna wê parastîye.

## VII- RAMYARA ÇEPA ŞOREŞGER DÎ DERBARÊ PÎRSA KURD DE

Tirkîye, welateke pirnetaweya netawên Tirk û Kurd û ji millîyetên têvel-hindikeyn lêdijîn e.

Netawê Kurd, di ser tevilî cenga rizgarîya netawîya Kemalîstan pêşewatî kirî bûyî re jî, piştî rizgarîyê, mafê çarenûsa sernivîsta netawê Kurd nenasîne; berepaşîyê vê ramyara tûnd û bihûjtinîya li ser netawê Kurd zêde bûye.

Netawê Kurd, li hemberê ramyara tûnda netawîkera erka Kemalîst çende caran raperîye. Belam, ev raperînen han serfiraz nebûyîne, erka Kemalî bi gelqirênan evên han tefandîne.

Çepa Şoreşger, pêdandina pîrsa Kurd ko bi şoreşa dijî-emperyalî, dijî-olîgarşî dê çareser bibe kirîye. Çiko, burjûvazîya netawê bindest, ji -wê- hêza çarekirina pîrsa bêpare. Ji milê din di roja me de di çarçewa kapîtalîzmê de pêkwerîya çarekirina pîrsa netawî tunne.

Çepa Şoreşger, ji kedkarên Kurd ko di nêv hêzên şoreşê yên hîmî de nin tevgerandinê, ne tenê kedkarên Tirk, kedkarên Kurd jî rêxistin û di bin yek banîde yekkirin amanç kirîye.

Lewra Çepa Şoreşger, bi pêşinî li hemberê şovenîzma netawê serdest ko ne ji alîyê yekbûyîna her du gelane têkoşînê dike. Belam, Çepa Şoreşger, li hemberê netaweperêzîya netawê bindest de ye jî. Lêbelê, berpeyîyên netawîyên netawê Kurd û têkoşîna wî ya di roja me de dajo piştgirîyê lêdike, çiko dizane hîmeke mafwera vê têkoşînê heye li hemberê olîgarşî û emperyalîyê. Ramyara Çepa Şoreşger, li nêvbera xwe û netaweperêzîya netawê bindest de xêzikeke stûr kêşan, belam di eynî demêde bi wê re hevkarî avakirin e.

Çepa Şoreşger, bawer dike ko, her du gel di bin eynî banê li hemberê emperyalî û faşîzmê de yekbibin, di pêşewatîya proletaryê Kurd û Tirk de, dê bişên şoreşa gelêrîya dijî-emperyalî, dijî-olîgarşî pêkbînin. Wiha pîrsa Kurd, dê bi hoyên berçav û berjevendîyên proletaryê ve lê hatî anîn dê bi çarekirineke vebir ve bişê bêye girêdanê.

## VIII- DÎ DERBARÊ PÎRSÊN SOSYALÎZMÊ DE NERÎNA ÇEPA ŞOREŞGER

Parvebûyîna di gêtîya sosyalîst de, salên 1960'an, di nêvbera PKÇ (Partîya Komûnîsta Çîn) û PKYS (Partîya Komûnîs-



ta Yekîtiya Sovyet) de bi têkoşîna îdeolojîk destpêkir. Di vê parbûnê de destpêkêde PKÇ li pey ramyareke rast diçû. Çiko PKYS bi revîzyonîzma Krûşçev're destpêkirî neyartîya Stalîn dikir, bi riyên haştîyê şîyana bûyîna şoreşan diparast, ramyarîyên bi emperyalîyê re pêkirinê dajot û dawî jî sosyalîzm bi têgihanek riyeke ekonomîstî/aborevanî/ şirove/te'liq/ dikir, digot bitena xwe pêşajotina hêzên berhemkarî dê bişê komûnîzmê bîne.

Belam, piştî 1970'yê PKÇ, bi berpeyîya PKYS hîn jî pîtir şemitî rastê. Yekîtiya Sovyet, bi "emperyalîya sosyal-civakî-" rûmetbarkir, bi emperyalîyê re dest bi pevkarîyeke vekirî kir.

Çepa Şoreşger, di vê parbûna gêtîya sosyalîst de, mîna grubên şablonîyên li Tirkîye, alîyê dewleteke sosyalîst her kîjan ji wan be negirt.

Revîzyonîya Sovyet jî, revîzyonîya Çîn rexne kir.

Çepa Şoreşger, pêdandina ko pêşîya revîzyonîyê neyê birîn dê ev, li welatên sosyalîst bingehê restorasyona kapîtalîyê bîne pê kir û di vê rasterê de dîtînen xwe raweyê rayagişkî kir.

Li Yekîtiya Sovyet bi hatina Gorbaçov ya ser erk re pêvajoyek nû destpêkir. Revîzyonîyê, ji sosyalîzmê, ji partîya komûnîst heya aborîya wê di hûndirê wan de pûçkirîne. Gorbaçov, bi ramyarên glasnost û perestroyka'yê riya ritimîya li pêşîya sosyalîzmê dest bi reçetên kapîtalî "pêvajoya jêqevaztinê" kir. Van bagerên "reform" a Gorbaçov, pêşîyê serpeyî li dewletên sosyalîstên Ewropa rojhilat kir. Derveyê Romanya welatên sosyalîst tev li ber van bagerên "reform"ê ketin. Li pêşîya dijakî/mixalefet/ya burjûva de ala destberdanê hildan û ew yan kirin nîvparên erk, yan jî erkên xwe hema bêje bi timî ji wan re berdan. Partîyên komûnîstên Ewropa rojhilat, li pêvajoyek nû hatin, yan navê partîyên xwe guhartin, yan jî feşilandin, di sinçek din de ji nûve damezrandin.

Li Romanya rewş der çêbû. Pêşewayê partîya komûnîsta Romanî Çavûşesku, wekî li pêşberê bagerên reformê stû xahr nekir bi derbeyek li ordîyê paldar û "bipiştgirîya gel" ya pişkî hat gêrkirin. Çavûşesku û şûya wî hatin kujtin. Vê jî li komûnîstên sosyalîzmê diparêzin serpeyî kir. Çepa Şoreşger, di ser tev çewtîyên Çavûşesku ên borîn re jî, parîstvanîya wî ya sosyalîzmê li hemberê bagerên "reform"ê de piştgirîya wî kir. Di hola pêşberê qetilgirina sosya-

lîzmê de ko herkes netirî mayî an jî, dij-şoreşî çepikandî de, çend pêşandanên dij-şoreşîya Romanyêde ev protesto kir.

Çepa Şoreşger, ramana pirsên sosyalîzmê yê ji revîzyonîyê dizên, ko di çapê gêtîyê de bi emperyalîyê re pêkirinê bi ramyarên reformên kapîtalîkaresatkirinê, dê neşên bîn çarekirinê diparêze. Ev awên han, ji vejînanîna kapîtaleya, dandebtpêkirina pêvajoya restorasyon/jinûveçêkirin/a kapîtalîyê pê ve tu encamine din neşêye bide.

Çarekirina pirsên sosyalîzmê, di bin dîktatorya proletaryê de li hemberê hêzên burjûva û kompoyên emperyalîstan bi kareshîya zorê; bi pêkanîna têkbûna di her bergehê de hîn bibizavtîrîn ya çîna karker û hêzên gelêrî di avakirina sosyalîzmê de; bi partîya komûnîst ji bûrokratîya ko wê ji gel bîyanî dike dûr girtinê; di çapê gêtîyê de bi emperyalîyê re pênekirinê; bi tim gîyanê enternasyonalîyê jî yandar girtin û bi têkoşînên rizgarîyên netawî û gelêrî re hevkarî avakirinê û ya hîn giringtîrîn jî bi afirandina "merivê sosyalîst" dişêye pêkwer bibe. Reçetên berepaşîyê vê timî dê kapî talîyê vejînin.

## JÎ VEKÎRANGA ROJHÎLATA NAVÎN VE GÎRÎNGIYA TÎRKÎYE

Ji vekiranga emperyalîyê ve cîyê tidkîye li rojhilata navîn di pîla dawîde girînge. Guhartinên li dewletên sosyalîst, bi emperyalîyê re pêkirina Sovyetê, vê girîngîyê ji nêvengê ranake, bitimî berepaşê vê rûyê Tîrkîye yê ber bi rojhilatanavîn hîn jî beltir dike.

Emperyalîyê, di rojhilatanavîn de xasma ji vekiranga berjevendîyên petrolê ve, li hemberê pêşajotinên şoreşgerî de rola cendirmetîyê lîstina Tîrkîye her jê xwestîye. Tîrkîye jî, her ji vî daxwazê re bersîva erênî daye. Stratejîya emperyalîya bi vê ramyarê re lêhatî, serî Israêl heyî bi rejimên din ên paşverûyên erêp re pevkarî kirina Tîrkîyê ye. Herweha, li serî tevgerên netawîyên Kurdistan û Filistîne heyî tevgerên şoreşger dê bişên bîn perçiqandin, dejîmên Erêp yê bi sinçê pêşverû (Sûrî, Lîbya) di bin tûnde de dê bişê bêye hiştin, pêşbirîya bê îstikrarîya di Lubnanêde ko bi şoreşekê encam bibe dê bişê bêye kirin.

Çepa Şoreşger, ji derketina xwe li nêvengê û vir ve pêdandina rola cendirmeyîya dij-şoreşîya Tîrkîye ko raberê rohilatanavîn kirî û li hemberê vê ramyarî kirîye.


Çepa Şoreşger, bi vê ramyara wê ve lêhatî, jibo alîkiri, na bi dirveke şoreşgerî çarekirina pirsra Filistînê ko pirsêk giringtirîna ji ên Rojhilatanavîne, bizavên piştevanîyên piştdayînên têkoşîna gelê Filistîn kirîne, bi hindeyê hêza xwe ev piştevanî berdome kirîye. Çepa Şoreşger, eynî hengê bi rêxistinên şoreşgerî yê Filistînî re çende pêyvendî avakirîne, kara ji nîzing ve nasîna wan kirîye.

Pirsra Kurd jî pirsêk din ya giringa rojhilatanavîne. Netawê Kurd ê ko ji mafên xwe yê netawî tevan bêpar hattî hêlan, li Îraqê, li Îranê, li Tirkîye têkoşîna netawî dide. Çepa Şoreşger, herdemî piştgirîya alîyê şoreşgerîya tevgera netawê Kurd kirîye, şoventî û şoventîya civakî mehkûm kirîye.

Çepa Şoreşger, herdemî paristvanîya divêtîya tevgerên şoreşger û pêşverû yê rojhilatanavîna ko bi hevûdin re di mildarîyê de bin kirîye. Dewletên cendirmên emperyalîyê Tirkîye, Îsraêl, Misir, Erebiştana Siûdî û h.d. ko li hemberê tevgerên şoreşger û pêşverûde nin û bi hevûdin re di yekîtiyê de nin, divê tevgerên şoreşger, pêşverû jî vîya he di nêvbera xwe de bi avakirina mildanîyê bibersiv bikin.

Çepa Şoreşger, di bîrewerîya tevgera şoreşgerîya ko li Tirkîye bipêşve dajo dê çendî serpeyîyê li ser plan û berjevendîyên emperyalîyê bike di rojhilata navînde ye. Şoreşa Tirkîyê, dê xurtîyek mezin bi dest têkoşîna şoreşgerî ya gelên rojhilatanavîna bike, emperyalîyê qels bike. Eynî demî şoreşa Tirkîye, di çapa gêtîyê de jî, dê emperyalîyê qels bêxe, dê moralê bide têkoşîna gelên binnîr, dê bawerîyên gelên welatên sosyalîst bi sosyalîzmê jîyandar biko.

Çepa Şoreşger vaye bi vê bîrewerîyê têkoşîna xwe ya şoreşgerî dajo. Em pêbawerîna ko, Marksî-Lenîni dîtina rastîna yekta ya gêtîyîye. Em pêbawerîna ko, sosyalîzm pêşeroja gelên gêtîyê tevan e.



TÜSTAV